



#CORONAVIRUS

Lêzanînên têkildarî Qerentîneya ji ber Vîrûsa Kovîd-19 (Covid-19) li sitargehên Rêveberiya parêzgeyhî ya karên Penaberan li Berlînê

Çima di dema niha da li sitargehên Penaberan rewşeke bilind a berçavgirtina ewlehiyê heye?

Li seranserî cîhanê vîrûseke nû bi navê 'Covid-19'ê belav bûye. Li hin welatan wekî Çîn, Îran an Îtalyayê, gellek kes bi giranî tûşî vê nexweşiyê bûne û mixabin hejmareke xelkê jî canê xwe ji dest dane. Zêdetir kesên kal û pîr û ji hêla tendurustiyê va lawaz ku ji pêş va nexweşî bi wan ra heye, li ber metirsiya vê vîrûsê ne. Kesên xortir heke bixwe nexweş nebin, dikarin vîrûsê veguhezînin. Ji ber vê yekê girîng e ku ev nexweşî zêdetir berbelav nebe. Xalên derbarê Berçavgirtina paqijiyê yên wek, Berdewam destên xwe bişûn, bila mala we paqij be, bila hîç têkilliyê bedênî tunebe, li her derê li ber çavan e.

Mebest ji Qerentîneyê çi ye? Çima ez nikarim ji sitargehê derkevim? Çiqas dem dibe?

Heke kesek li sitargehê vîrûs pêre hebe, ev yek ji Wezaretê Tendurustiyê ra dê were ragihandin. Bijîşk li wir dikarin bi qasî 2 hefteyan têkilliya bi derve ra qedexê bikin: Wê çaxê destûra te tunebe ku terka sitargehê bikî, yanî nexebitîn, neçûna bo dibistan an cihê fêrbûna Kar, nekirîna kelûpelan an nedîtina dost û hevalan. Ji vê yekê ra Dabirrîn anku Qerentîne tê gotin.

Îca biryarên seredana 'LAF' an 'JobCenter' yê bi çi awayî bibin?

Ji kerema xwe di dema Qerentîneyê da jibo hevdtîne seredana rêveberiyên neke. Ji kerema xwe Email'ekê bişîne an digel berpîrsên ku têkilliya wan bi rêveberiya ra heye, biaxive. Her wiha tu nikarî seredana 'LAF' an 'JobCenter'ê bikî û li bara sitargehên din bipîrsî. Te bi hîç awayî destûra derbasbûna nav ofîsan tunebe.

Heke ez Qerentîneyê bînpê bikim û terka malê bikim, yê çi biqewime?

Kedkar erkdar in ku bînpêkirina Qerentîneyê ragihînin. Sizaya bînpêkirina Qerentîneyê dikare cezaya pere an heta du sala zîndan be. Heke vîrûs veguheze kesek din, îmkana gilîkirinê li ser ziyangihandina bedênî ji ber sistiyê, heye.

Gelo divê ez di odeya xwe bimînim?

Ji ber asta zêde ya gengaziya tûşbûna bi vîrûsê, riya herî baş ev e ku keşn tûşbûyî di odeya xwe bimînin. Ev yek hemî kesên bicîhbûyî li cihê mayîne, ji wan zarok û nûciwanan jî digire ber xwe. Ewna dikarin dema lîstinê, hevdu tûşî vîrûsê bikin.

Îca çi kesek ji min û malbata min xwarekê amade dike?

Taşte, navroj û şîva kesên ku di Qerentîneyê (quarantine; Dabirrîn) da ne bo wan tê radestkirin. Heta divê demê da kirrîn jî nepêkan e.

Heke ez şolker bim, divê çawa vê yekê ji xwediyê karê xwe ra bibêjim?

Ji kerema xwe derdem bi riya Telefon, Whatsapp an Email'ê, rêvebir an xwediyê karê xwe derbarê Qerentîneyê agahdar bike. LAF piştrastkirina dem û roja Qerentîneyê bi riya bikarêner (operator) ji te ra dişîne. Ji kerema xwe piştî ku vegeriyayî cihê karkirinê, vê nameyê bide cihê karkirina xwe. Pêwîst nîne ku êdî nîgerana girêbesta xwe ya karkirinê bî.

Gelo min berdewam hewcetî bi dermên heye? Ez çawa wan bi dest bixim?

Kesên ku berdewam hewcetî bi dermên hene, hema wisa wan werdigirin? Bikarêner bi giştî xebata organîze dikin. Hinek ji dermanxaneyan jî xizmetên şandinê bi kar tînin. Loma derman piştî siparişê bo cihê mayîne tîn raberkin.

Ez çawa kelûpelên xwe yên rojane dabîn bikim?

Kelûpelên tendurustiyê yên weke pûşek an Podreya Kincşûştinê, her wiha berhemên tembakoyê (Tobacco) dikarî bi riya operator va sipariş bikî û ji Dikanan werbigirî. Bihayê kelûpelan beriya siparişkirinê dê were ragihandin.

Di heyama Qerentîneyê da, gelo ez dikarim jibo şuştina kincan herim xaniyê kincşuştinê?

Di dema niha da paqijî, nemaze derbarê kinc û cil û bergan gellek girîng e! Hema wisa dê demên şuştina bi makîneyan hebe. Ji kerema xwe wan bi baldarî bi kar bîne û rûtextî û rû-balgehiya xwe jî berdewam bişû.

Ez ji ku dikarim agahiyên zêdetir derbarê Vîrûsa Koronayê bi dest bixim?

www.berlin.de/corona

<https://www.berlin.de/laf/leistungen/gesundheitsinfektionsschutz/>

www.facebook.com/WillkommenszentrumBerlin

We thank you for your patience and support. Please, let's all stay healthy!



20.03.2020

www.berlin.de/laf/leistungen/gesundheitsinfektionsschutz/

be  **Berlin**